



## **Daxuyaniya Rêgezên Konferansa 'Ciwan Dîrokê Dinivîsin'**

Weke ciwanên cîhanê, her wiha bi giştî mirovahî, em îro bi qeyranekê pergale ya herî dijwar re rûbirû dimînin. Felaketa ekolojîyê roj bi roj girantir dibe, şer li her deverî gûr dibin, netewperestî û tevgerên faşîst li seranserî cîhanê belavdibin. Ji bo têkirina birçîbûna xwe qezenca zêde, pergala kapîtalîst a kûrewî jîngehê hildiweşîne û mirovatiyê ji bingeha xwe ya jiyane bêpar dihêle. Encamên wê yekê li herderê hem nava jiyane, hem jî li derûdora me tê dîtin û hîskirin: tecrîda civakî, kuştina jinan, feqîrtî, azar, şîddet û felaketên xwezayê. Em di cîhanekê xwedî felaket û karesatên dijwar de mezin dibin, lê rastiya heyî ku pêşkêşî me tê kirin em qebul nakin. Îro li cîhanê ciwan xwe birêxistin dikin û ji bo pêşerojekê baştir têkoşîne dikin. Ciwanbûn ji bo me tê wateya lêgerîna heqîqetê, lêgerîna dunyayekê din û pêşerojekê azad. Em bi bawer û bi biryar in em ê xwe bigihînin vê armancê. Heger em mudexeleyê qeyranê nekin, kî bike? Heger em ji niha ve destpênekin, em ê kengî bikin? Li ser vê bingehê em di çarçoveya insyatîfa 'Ciwan Dîrokê Dinivîsin' hatin cem hev, da ku têkoşîna hevpar li ser zemînekê hevbeş pêşbixînin.

Em dixwazin bi hev re nîqaş bikin, xwe perwerde bikin û xwe bi rêxistinbikin. Ji ber vê yekê, weke 400 ciwan ji 49 welatan û 95 rêxistin, tevger û partiyan em diyar dikin:

1. Çareseriya qeyrana heyî ya cîhanî encex ji derveyî pergala kapîtalîst û bi avakirina cîhanekê nû, demokratîk û bi edalet dikare were pêkanîn.

2. Ji bo xwe gihandina vê armancê yekitiya tevahî hêzên demokratîk-şoreşger û dij-sîstemê di astekê cîhanî de pêwîst dike. Weke 'Ciwan Dîrokê Dinivîsin' em li ser bingeha rêzgirtina hevpar ji bo dewlemendî û cudahiya rê û rêbazên me yê rêxistinbûn, têkoşîn û kevneşopiyên siyasî xebat dikin. Em ji bo pêşxistina yekitiya tevahî têkoşîn û berxwedanên li cîhanê ku di nava nakokiyekê esasî bi pergala desthilatdar de ne kar dikin.

3. Rêgeza me ya sereke ya rêxistinî 'yekitî di cihê rengiyê de' ye. Bala me li ser rêgez û armancên me yê hevpar e, her wiha hevbeşiya me ya esasî dijbertiya kapîtalîzmê ye. Di heman demê de em cih ji ferq û cudahi, nêrîn û rêbazên cuda di teorî û pratîkê de dihêlin.

4. Pratîka me ya hevpar li ser bingeha enternasyonalîzmê pêşdikeve. Em dizanin ku cîhanekê din encex bi riya têkoşînekê hevpar ya tevahî gelên bindest

û azadîxwaz dikare pêşbikeve. Em yekitiya gelan weke nirxekê esasî ya insyatîfa xwe destdigirin.

5. Em li hemberî hemû cureyên zordestiyê, her wiha li hemberî kapîtalîzm û îdeolojiya wê lîberalîzmê, ku civakê li ser esasî destgirtinekê sexte ya 'azadiyê' perçedike û ferdperestiyê pêşdixîne, li dijî zilamsalarî û talankirina xwezayê, tunekirina jîngehê têkoşînê dikin. Em bi hev re li hemberî zayenperestiyê, nîjadperestiyê û hemû şêwazên zordestiyê li ser bingeha zayend, nasname, ol, astengî, ziman û netewî disekinin.

6. Di têkoşîna li hemberî her şêwazî dagirkerî û mêtîngeriya de em yek inç Her civakek xwedî mafê rewa yê xwe-parastinê ye. Di vê çarçoveyê yek ji erkên sereke yên enternasyonalîst a ciwanan ew e ku li hemberî politikayên emperyalîst ji welatên me tîr birêvebirin derkevin û têkoşînekê mezin bidin meşandin. Em mafê her gelekî ya xwe-birêvebirinê diparêzin û piştgiriya xwe bi tevahî gelên bindest, bi taybetî gelê Filistin û Tevgera Azadiya Kurdistanê radigihînin.

7. Em faşîzm weke dijminekê esasî ya mirovahiyê pênase dikin û mezinbûna tevgerên faşîst û paşverû weker xeterî û metirsiyekê esasî li ser jiyaneke aştiyane û pêşeroja civakên xwe dibînin. Wek insyatîfa 'Civan Dîrokê Dinivîsin' em bi biryardariyekê ji pola li gel hemû têkoşînên antî-faşîst disekinin.

8. Civan di her civakekê de beşa herî dînamîk in û motora guhertin û veguhertinê ne. Mîsogeriya nûbûna têkoşîn û tevgerên me, bi rêxistinbûna xweser a ciwanan li ser bingeha îrade û hêzbûna serbixwe mumkin e.

9. Em bi xurtî li kêleka gelên têkoşer disekinin û piştgiriya xwe bi hemû têkoşînên şoreşger re radigihînin. Em herêmen rizgarkirî û herêmen xwedî rêveberiyên xweser ji Abya Yala heta Rêveberiya Xweser ya Bakur-Rojhilatê Suriye û Şengalê, çiyayên azad ên Kurdistanê, kelehên berxwedanê yên tevgerên rizgarî û antî-emperyalîst li Asya, her wiha têkoşînên rizgariya netewî li Ewropa û têkoşîna berdewamî li dijî mêtîngeriya û neo-kolonyalîzm li Afrîka weke cepheyên pêşî yên mirovatiya azad dihesibînin. Parastina wan destkeftiyên têkoşînên, her wiha parastina destkeftiyên dîrokî erka û berpirsyartiya me hemûyan e.

10. Gava ku ji aliyekî ve desthilatdarên vê dunyayê bi awayekî koordînekirî li hemberî me dikevin harekete, agahî û istixbaratê ji bo tasfiyekirinê têkoşînên azadiyê bi hevdu re parvedikin û di astekê navnetewî de li pey hêzên muhalîf û şoreşger dikevin, tevgerên me piranî caran ji hev cuda û perçeyî dimînin. Hêzên desthilatdar ruxme hemû nakociyên di nava hev de jî di vê çarçoveyê de bi awayekî koordînekirî harekete dikin, ji ber vê jî piştgiriya navnetewî û hevgirtinê ji bo me jî şertekê esasî ye. Tevgerên me li kûderê di bin êrîşê de bin em ê piştgiriya hev bikin. Em ê ji bo azadiya hemû girtiyên siyasî yên şoreşger bixebitin. Di çarçoveya kampanya cîhanî ji bo azadiya fizikî ya Abdullah Öcalan, ku di 10'ê Cotmehê 2023'an de destpêkir, em beşdarbûna xwe û piştgiriya daxwazên kampanya 'Ji Abdullah Öcalan re azadî - Ji pîrsgirêka Kurd re çareserî radigihînin.

Ji vir û şûnve wê hevgirtina me li ser bingeha van 10 xalan pêkwere. Dibe ku şêwazên me yên fikirandinê û rêbazên me ji hev cuda bin. Çand û zimanên me

jî ji hev cuda ne. Hinek ji me ji tevgerên mezin, hinek ji me ji tevgerên biçûk hatine. Lê em ferq û cudahiya xwe wek astengi li pêşya xwe nabînin. Em cihêrengbûna xwe weke dewlemendiyekê girîng dibînin. Li ser vê bingehe em dixwazin nîqaşên xwe pêşbixînin, ji tecrubeyên hev sûd werbigirin, ji hev tiştên nû fêrbibin û hêza xwe mezin bikin. Ferq û cudahiya me hêza me ye, wê nebe sedema lewazbûna me, wê li ser rîya me ya hevpar quwet bide me. Di bingeha wê de dijayetiya me li hemberî kapîtalîzmê û îsrara me di mirovbûnê de ye. Rûbirûyî qeyrana pergalê, geşbûna şer, felaketa ekolojîyê, kolekirina jinan û pergalekê ku dixwaze mafê me yê jiyaneke bi rûmet ji me bistîne, ferq û cudahiya me divê li pêşya me nesekinin. Wek ciwanên roja me ya îro berpirsyartiyekê me beramberî dîrokê heye. Em ê li benda siberoj nebin, em ê jiyana azad îro avabikin. Û em bi biryar in ji bo vê têkoşînê bilind bikin. Ev cîhan û mirovatî xwedî pêdiviya ciwantiyekê xwedî îrade, hêz, rêxistinî, jixwe bawer û radîkal. Pirsgirêkên heyî di çarçoveya pergala kapîtalîst nîkarin werin çareserîkirin, lêgerîna çareserîyan di hundirê qefesa pergalê bi xwe re tu feyde nayîne. Kapîtalîzm mirovatîyê aniyê ber kendalê. Hebûn û jiyana me bi têkbirina kapîtalîzmê û avakirina jiyaneke alternatîf, cîhanekê alternatîf mumkin dibe. Encamên ku em ji rewşa heyî derdixînin bi awayekî pir vekirî ji me re nîşandide ku divê em di demekê herî nêz de bibin hêzekê rêxistinî. Yekitiya ruh û hêz a ciwanan ji bo têkoşînê azadiyê li tevahiya cîhanê pêwistî û pêdivî ye. Heger di sala 1848'an de Manifestoya Komunîst, ku heta îro li ser mirovatîyê xwedî bandorê, bang kir: 'Karkerên cîhanê bibin yek!', vê demê em jî îro li vê mîrasê xwedî derdikevin û bang dikin:

**'Ciwanên cîhanê bibin yek û bi hev re vê cîhanê biguherînin!'**

Parîs, 5'ê Mijdarê 2023,  
Yekemîn Konferansa Ciwanên Cîhanê - 'Ciwan Dîrokê Dinivîsin'